# GIRINGIYA WÊJEYÊ Û REWŞA WÊ LI ROJAVAYÊ KURDISTANÊ



Beşîr MELE NEWAF

Di bin teoriya "Ez dihizirin dêmek ez heme", di mentiqê felsefeyê de, rastiyek e.

Ji bo wêjeyê hatiye gotin:"Madam ez diêşim dêmek ez heme".

- "Helbest pêwîst e … ah xweska min zanîba çima?"

Bi vê gotinê Can Kokto, şanonivîs û helbestvanê Frensî, bi girîngiya hunerê mereqdar bû… Di heman demê de, ji bo rola hunerê di serdema birciwaziyê de, heyirî ma.

- Li hember vê dîtinê wênekêşê Holendî, Mondiryan dibêje:" Huner wê winda bibe, kengî jiyan bigihê pileyên bilind ji hevsengiyê. Lê hevsengiya mirov bi cihwariyê re, ne gengaz e ku di bilindtirîn şêwazê civakê de be jî.

- Ango wê huner, giringiya xwe biparêze ji bo siberojê, mîna ku girîng bû di serdemên borî de.

- Dibe ku were gotin kesek bibêje ez dikarim bê huner bijîm?

- Lê mirovahiya pêşîn bi diyardeya hunerê re hatiye hûnandin, di karanîna dest û tiliyan de, di çêkirina alavên pêwîst, ji danheva berhem û nêçîran…Pirsa wêje û hunerê di pêvajoya dîroka mirovahiyê de, piyekî bingehîn e… Di gewdekirina mirovan de, ji bo lêkolîner û kesên têkildar, mirov li ser sê hêmanan ava dike.

**1-Beden:** Pêwîstiya wê bi xwarin, vexwarin û werzişê heye.

**2-Aqil:** Pêwîstiya wî bi zanîn, nasîn û felsefeyê heye.

**3-Dil û giyan:** Pêwîstiya wan bi dilnazî, hezkirin û mehrebanî, azadî, bedewî yarmetî …hene, ev jî di huner û wêjeyê de bigewdekirîne, pê mirovahiya mirov tê avakirinê

- Debirîna bi zimanî, ji bo her tiştî, xwe dispêre pîvanên `aqlane. Lê ji bo helbestvan dema dabaşa tiştan dike, xwe dispêre pîvanê dermadî û xeyal û nîgaşê.

Xeyal û nîgaş jî, diyardeyeke mirovahiyê ye, ji nêz ve bi rewşa cihwariya jîngehî, siyasî, aborî, ve bestî ye. Ya ku newekhevî û têviliya celebên wêjeyên miletan tekez dike, di şêwaz û taybetiyan de, diyar dibe xeyal bixwe ye. Ji newekheviya jiyana wanî civakî, siyasî, abûrî …tê

- Mînak: Stran, helbest, roman , şano…Yên Kurdan û yên Ewropiyan, ne di heman qalib û mijar û



xeyalan de hatine zarîevekirin.

- Heger me qebûl kir ku wêje û huner derencamên êşê ne û ji bo çakî û sîqalkirina êşê jî, mirov dihizir û diponije û dixeyile.

- Ji xwe êş jî bê pîvan in, ne tenê beden û derûnê mirovî bi êşên madî yekser dişêin: Êşa herî dijawar ji mirovahiyê re, êş û derdên bê `edaliyetê ne: Bêrûmetiyê ne ango derdê pêdiviyên madî û manewî ne

- Berhemên ku hatine komkirin ji çanda mirovahiyê û heta roja îro, ji ber jana bêsengiya di navbera mirovan bi xwe de ye, û ji milekî dîtir di navbera mirovan û xweristê de ye.

- Şoreşên sereke di pêvajoya dîroka mirovan de, rû dane û veguheztinên mezin bi xwe re anîne, bi wêje û hunerê re, hatine hûnandin. Çi di demên qolincan de, û çi di pey şoreşan de, di zarîvekirinên erênî û neyînîyên wan de.

Heger em bên wan regez û faktorên

gelemperî, di têkliya şoreş û civakan de, daxin ser rewişa kurdî, hema bi lez be jî em ê çend qonaxan li ber çavên xwe bibînin.

**1. Qonaxa Wêjeya Devokî**: Tê de qalkirinên li ser kêferata nabvera çakî û bedkariyê hatiye kirin, di kesayetiya hût û efsûner, lawir , mîr û şah û belengazan de, di pend û gotinên Kurdan de, şêrînkirina bedewî û sincwerî û baştirîn reftar û têkilî hene.

**2. Qonaxa Kilasîkî:** Heman zarîvekirin û qalkirina ji bo divaya sîqalkirin û şûştina derûn û pêşketina sinc û reftar û rewiştan ne. Di helbest û destaneyan û sitran û dîlokan de, diyar in.

**3. Qonaxa `Eqlane:** Yekser wêje xwe noqî, aliyê madî, manewî yên civakê dike. Derdê bêsengî û hedanê dispêre nezanî û cehaleta civakê û zordariya hakim û qiralan … Ji Ehmedê Xanî dest pê dike û heta dighêje hilweşîna împeratoriya Osmanî.

**4. Qonaxa Şiyarbûn û Hizra Neteweyî:** Heta sala 1930 di nav de, serhildanên kurdan û şoreşa Oktoberê: Ji Hewara Celadet dest pê dike heta salên 80'yî.

**5. Qonaxa Sala 90`î Heta Salên 2011`ê:** Wêjeya Kurdî li dergehên nû geriya, bi destpêka pêngava romanê û helbesta nûjen dest pê dike, li ser mîrasê her çar qonaxên bûrî, bi aliyên xwe yên erênî û neyînî, bênderek ji kel û pelên wêjeyî, hatiye komkirin û hin bingehên ciwankariyê hatine danîn. Kêm zêde, parîk ji wênekirina qonaxa xwe bi gewde kiriye.

Em karin bêjin ku wêjeya Kurdî ben û qeydên qirkirin û têkçûnê qetandine û li ser mîrasekî hatiye avakirin... ji bo nifşên îro û siberojê bingehek hatiye lêkirin.

Pirs, gelo ji bo wêje û hunera Kurdî giringiya xwe biparêze û bibe mal û bala civaka kurdî, bi heman rêbaz û alavên zimanê qonaxên çûyî û bi heman qalib û teqlîdê, wê karibe cîhê xwe di qada bersivdayîna xewin û xeyalên miletê xwe bi cîh bike?

- Di van demên ku her alyê jiyanê ketiye ber alavên nû ji komunîkasyon û ragihandin û teknîkê, dinya kiriye gundekî biçûk. Ji hêleke dîtir hîmên bingehîn yê yekitya netewî roj biroj ber biderizandinê ve diçe ji ber bandora asîmilasyon û otoasîmilsyonê ku dagîrkerên kurdan li ser miletê kurd ferzkiriye..heya vê kêlîkê bi her rêbazên hovane li tunekirina doz û çand û zimanê Kurdî digerin. Ev siya tarî barê wêjevan û kesê têkldarî pirsa wêjeyê bêtir giran dikin, di ser re hin alî berê wêjeyê û wejevanyê didin qadin dîtir, û ji ber dagerînê ve arman û peyweriya wêjeyê qels dibin. Weke em dizanin ku wêjevan ne istratîgnas e û rêxistinker û dîtenêr e, xîtab wî şûna xîtabên siyasetmedaran ngire

û her wiha xitaba siyasetmedearan jî nikare şûna derbirînên wêjevanyê bigire.

- Heger derbirîn û xitaba siyasî ji bo tevdana mejî ye, ya wêjevan tîşkên wê ber bi dil û canan ve ye .

- Deh çemên dagirtî ji şoreşê

Têra gemara 1500 salî ji bê edaletya komkirî nake.

- Ji dirgên Axwirê Ogist bêtir li van deveran Hirqel û Homîrosan dixwaze.

- Heger tu bide ser rêça tolhildanê,

Tu seetê zeman û mekanî tevda bipelixîne,

Têra hinikkirina girrê te nake.

- Tu pirtûkxanên dîrokê tevdan bicû û pê tûke riwê setemakar û diktator û xayinan bike.. têra şuştina tewna ciwanê ji bo bi Tirkî nizanîbû li Amedê hate darvekirin, nake.

- Xeyal û nîgaş di wêjeyê de bê sînorin... heger nasîn û zanist çendî li pêşbin, dîsa li tixûbekî radiwiste, lê wêjeya bi xeyalan hatibe ristin di asoyekî bê dawî de ye..

- Pir tiştên ku doh hin nivîskar û hinermendan weke niyaz û xiyal tevin dabûn îro rastiyan himbêz dikin... Helbest û stranê ji bo azadî û jiyaneke birûmet nifşên beriya me digotin, îro em bi wan re jiyan dikin..emê ji bo siberojê çi li ser îro av bikin?

- Mufekirê Sûrî Edonîs di hevdîtinekê de wiha tîne ziman:

"Bi hezaran helbestên bejinbilind nikarin berkek tivingê vegerînin, belam yek şehîdek dikre cokên dîrokê biguherîne"

Ez jî dibêjim, bêgûman şehîdekî wiha xwedan viyan û hezkiryê mirovahiyê û gelê xwe, ne hema çêdibe, ew bi xwe derencamê paşxaneyeke ji çand û wêje û huner û reftarê civakeke saxlem e.

- Belam rewşa helbest û wêjeya Kurdî li Rojavayê Kurdistanê, di rêveçûna xwe de li paş pingav û geşpêdanên heyî ye, ji dêvla ku milbimil bi rewşên heyî û eniya tekoşînê re li kar be, beşek xwe vedikşîne bi behaneyên pûç û vala û bi cilikên qonaxên berê xwe dinixumîne û beşek jî li tembûra pesindan û şabaşan dixînin mîna dengbêjên odayên berê, ji dêvla arê şoreşê gur bike xwe dide ber berberoşk û tîna berxwedanê.

- Êdî ne gengaz e ku em bi tiştên di qonaxên berê de hatine qalkirin dubare bikin, karibin wêjeyeke serdemî ava bikin û bibe cewherê divaya xem û xeyalên miletê me, piştî ewqas gorî, ked û şîn û şahiyên vê qonaxê bi hûrguliyên wê, di çarçoveyeke hunerî de bixemilînin ku bikaribe sînorên xwe yên neteweyî derbas bike û bibe wêjeyeke cîhanî.

*28-5-2022/ Weke Semîner di Hefteya Wêjeyî de li bajarê Qamişloyê hatiye pêşkêşkirin.*